



## **Agehî bo dêbavan**

Nuha em xwe li xwendegehê bêhtir dilivînin

Îroj li Swêdê gelek zaro, li gelek demên li nav rojê bêliv dirûnin – me divê em vê biguherin. Tevgera sporê di gel xwendegehê hevkarîyê dike da ku dilxweşiya li warê sporê peyda bike. Ev erkek e, ku hikumet daye Riksidrottsförbundet'ê (federasyona sporê ya netewî) ku li seranserê welêt pêk bîne.

Vekolîn nîşanî me didin, ku ew zaruyên ku sporê dikin, li fêr û dersên xwe, êdî serkeftîtir in. Spor alîkarîyê dike da ku zaro:

- baştir fêr bibin
- baştir bala xwe bidin dersa
- hişê wan baştir vedibe
- baweriya wan bi xwe pirtir dibe

Li wan xwendegehên ku li nav rojê bêhtir spor tê kirin, mirov dibîne, ku kêmtir pevçûn çêdibin û derfeta dilxweşi û hevbendiyê bêhtir peyda dibe.

Loma em ê bi gelek awayan bixebitin da ku zaro li nav roja xwendegehê sporê bikin.

### **Hin rêpêşkirin û pêşniyar bo dêbav û/weliyên zaroyan**

Tu wek dêbav, bi kirina şîretên derbareyê girîngiya sporkirina rojane, dikarî bi alîkarîya zaroyê xwe rabî. Yek ji van çend şîretên hêsan ev e; ku li şûna çûna bi asansorê, çûna ji nêrdiwanan, yan jî, wêstgehek berî çiyê daketinê, daketina ji otobusê. Tu dikarî berê zaroyê xwe bidî bo sporê, yan jî, di gel komeleyeke sporê pêwendî bike. Ma çima tu di gel zaroyê xwe rê nemeşî? Hingê tu wê jî wan encamên baş ên spora rêveçûnê di xwe de jî bibînî.

Her dem ji xwendegehê bipirse, ku li xwendegehê çi çalakiyêke nû ya sporê wê biqewime.

Me divê em alîkarîyê bikin da ku şagirdên me ji sporê hez bikin, li warê sosyal xwe pêşxînin û bikaribin biwêrin hingavên ber bi pêş ve biavêjin. Me divê ew hêdî hêdî xwe baştir bikin, li xwendegehê serkeftîtir bin û jiyanêke aktîv û xweş bijîn.